Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :430 nameronahi@gmail.com 9- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Gav bi gav rizgarkirina Minbicê

Cûma MIHEMED
Şîlan MIHEMED

Li Bakurê Sûriyê, Pêngava Rizgarkirina Minbicê yek ji şerên herî dijwar bû ku li dijî çeteyên DAIŞ'ê hate dayîn. Gelek fermandar û şervanên ku di nava vê têkoşînê de cih girtin behsa wan kêliyan kirin. "Çi rojeke tirsnak bû." Bi vê hevokê fermandar Egîd Ehmed behsa roja yekemîn a hemleya rizgarkirina Minbicê kir. Egîd Ehmed fermandarê tabûrên Şems El-Şimal e, di nava hevalên xwe de bi navê Egîdê Şems El-Şimal tê naskirin.

Hemû awir li ser gundê Halûlê bûn, şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê plana têketina gund amade kiribûn. Armanc rizgarkirina gund bû, wê bibûya yekemîn gundê ku di pêvajoya hemleyê de were rizgarkirin. Berê lûleyên çekan li çeperên DAIŞ`ê bûn, êdî şer dest pê kiribû.

Tabûrên Şems El-Şimal yek ji mezintirîn hêzên di nava Meclisa Leşkerî ya Minbicê de ye, bi beşdariya bi sedan şervanên ku piraniya wan ji welatiyên Minbicê ne, bi awayekî çalak tev li hemleya rizgarkirina Minbicê bûn.

Baskê yekemîn ê hemleyê ji bendava Tişrîn ku 25 km dûrî bajarê Minbicê ye, dest pê kir. Baskê duyemîn jî ji pira Qereqozaqê ku ew jî 25 km li rojhilatê Minbicê ye, dest pê kir.

Egîd û komek hevalên xwe di nava şerên li baskê yekemîn diqawimîn de bûn, nêzî 75 şervanan êrîşa yekemîn a li dijî çeperên DAIŞ`ê yên li gundê Halûlê yê nêzî bendava Tirşrînê kirin.

Egîd Ehmed dibêje ku çeteyên DAIŞ`ê fuzeyên antîtank bi kar dianîn û xeteke parastinê ya bihêz çêkiribûn, çeteyan dizanî ku hemleyê dest pê kiriye. Egîd Ehed wiha pê de diçe: "Di roja yekemîn de erebeyeke me ku doçka li ser bû û dozerek jî hatin derbkirin, rojeke bi tirs bû, em 75 şervan bûn, me xwe wek komên ji 5-6 kesan pêk tê, belav kiribû, paşê me wê rojê şer rawestand, ji ber ku rojeke bi tirs bû, lê roja din me şerê xwe dewam kir û em nêzî 500 metreyan di nava gund de bi pêş de çûn."

Çeteyên DAIŞ`ê wê çaxê çeperên xwe li gundên nêzî çeperên şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê asê kiribûn û wekî ku Egîd Ehmed jî got, çeteyan ji bo rê li pêşdeçûna erebeyên şervanan bigirin fuzeyên antîtank bi kar dianîn. Şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê 3 rojan li gundê Halûlê şer kir, piştî 3 rojan û bi alîkariya balafirên şer ên hevpeymanê gund rizgar kir û berê xwe da gundê Elelûş ku li kêleka gundê Halûlê ye. Egîd Şems El-Şimal dibêje ku êdî gundên li paş xeta parastinê, yek bi yek diketin destên şervanan, ta ku şervan gihaştin gundê ku fermandarê Şems El-Şimal ê wê çaxê Feysel Ebû Leyla lê şehîd bû.

**FERMANDAR EBÛ LEYLA ŞEHÎD BÛ**



Her ku diçû şer jî diwartir dibû, şervanên Meclisa Leşkerî ya Minbicê bi lez pêşde diçin û her roj gundên nû rizgar dikin ta ku gihaştin gundê Cib Elxefî yê nêzî bajarokê Ebû Qelqel.

Li wî gundî çeteyan xwe di nava sivîlan de vedişart, şer li wir dijwar û giran bû, hemleya ku 1`ê Hezîranê dest pê kiribû, ketibû roja xwe ya 3`yemîn, di wê rojê de fermandar Feysel Ebû Leyla birîndar bû.

Çaxê ku şervanan gund rizgar dikir, ketin kemîneke çeteyan, ew 5 şervanên tabûrên Şems El-Şimal bûn, hin jî yên YPG`ê bûn û şervaneke YPJ`ê jî di nava wan de bû. Şervan ketin gund, ji wan we ye ku gund vala ye, lê dema deriyê sînor ji aliyê Tirkiyeyê ve vebû, nêzî 500 çeteyên DAIŞ`ê ketin gund û şervan dorpêç kirin. Fermandar Feysel Ebû Leyla wê çaxê nû ji nexweşxaneyê derketib û(emeliyat bûbû), lewma pêwîst bû ku demekê nekeve nava şer, lê çawa ku bihîst hevalên wî ketine çemberê, çeka xwe hilgirt û çû qadên şer da ku hevalên xwe ji çemberê xilas bike.

Şervanekî ku bi alîkariya Ebû Leyla ji çemberê rizgar bû, dibêje ku Ebû Leyla bi xwe bi çeka giran li mala ku 50 çeteyên DAIŞ`ê lê bûn, xist û mal bi serê wan de şewitand. Paşê ew vegeriya baregeha xwe, fuzeyek li cihê wan ket û Ebû Leyla bi giranî birîndar bû, ew rakirin nexweşxaneya bajarê Silêmaniyê ya başûrê Kurdistanê, lê piştî 2 rojan şehîd bû. Cenazeyê Ebû Leyla bi merasîmeke





biheybet li bajarê Kobanê hate oxirkirin.

**ŞER GIRAN DIBE**



Egîd Şems El-Şimal wiha pê de diçe: "Çeteyên DAIŞ`ê wisa bawer dikir ku piştî şehîdbûna fermandarekî me yê payebilind dê moralê şervanan bikeve, lê tişta çêbû berevajî wê bû. Dema şervanan bihîst ku Ebû Leyla şehîd bûye, şer girantir bû û şervan pir bi lez pêşde çûn, her wiha gelek ciwanên Minbicê tev li nava refên me bûn. Çeteyên DAIŞ`ê bi heman şêweyî şer dikir, dîsa fuzeyên antîtank bi kar dianîn, lê hevalên me bi lez bi pêş diketin û her roj gund rizgar dikirin.

Di heman roja şehîdbûna Ebû Leyla de, şervanan bajarokê Ebû Qelqel ê 15 km li başûrê bajarê Minbic ku cihekî stratejîk e, rizgar kir û berê xwe da bajarê Minbicê. Di vê navberê de baskê duyemîn jî, baskê Qereqozaqê, li rojhilat û bakurê Minbicê bi pêş diket û gund rizgar dikirin.

**DORPÊÇKIRINA BAJAR**

Li gorî plana Meclisa Leşkerî ya Minbicê û bi hevkariya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û hêzên hevpeymana navneteweyî, dê bajarê Minbicê ji her çar hêlan ve bihata dorpêçkirin û paşê şerê li bajêr dê dest pê bikira. Dihat payîn ku şerê bajêr şerekî giran be.

Her du baskên hemleyê li gorî planê bi pêş de diçûn, baskê yekemîn ji aliyê bendava Tişrîn ve gundên li bejahiya başûrê bajêr rizgar kirin û baskê duyemîn jî li rojavayê bajêr heta çerxerêya gundê Eloseclî bi pêş de çû.

Di vê navberê de şervanên QSD`ê li aliyê baskê Qereqozaqê pêşve çûn û gundê başûr ên li ser çemê Sacûrê rizgar kir û gihaştin çerxerêya Eloseclî. Li wir her du baskên hemleyê gihaştin hev û çeteyên DAIŞ`ê di nava bajêr û çend gundan de dorpêç kirin.

Piştî ku her du baskên hemleyê gihiştin hev, şervanan dest bi rizgarkirina gundên mayî kir, şervanan bajar ji hemû aliyan ve dorpêç kirin. Êdî dema şerê mezin, şerê bajarê Minbicê nêzîk bû.



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 430 9- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li Mûsilê lihevkirinên Erdogan û DAIŞ'ê yên veşartî


إرهابي مغربي لـ"القضاء": سعينا لجلب الأسلحة الكيميائية من كوريا الشمالية

Serçeteyek DAIŞ'ê li dadgeha Iraqê hin hevkariyên serokê rêjîma Tirk Erdogan û çeteyên DAIŞ'ê eşkere kir. Serçeteyê DAIŞ'ê yê bi navê Îsam Hena diyar kir ku li Mûsilê dîplomatên Tirk li miqabilî 450 çeteyên DAIŞ'ê yên li Tirkiyê girtîbûne de hatine berdan. *R-2*


# ÊZIDÎ Û ELEWÎ DI BIN ZEXTA DAGIRKERIYÊ DE NE



Komên leşker û çeteyên dewleta Tirk a dagirker kiryarên mîna guhertina demografîk, talan, revandin, kuştin, bişavtin û qirkirinê ya li dijî gelê Efîrnê bê navber didomînin. Dewleta Tirk û bi çeteyên xwe piştî ku Efrîn dagirkirin û şûnde hemû cih û warên dîrokî û pîroz yên Elewî û Êzidiyan jî bi heman rêbazê DAIŞ'ê tune kirin. Her wiha niha jî bi darê zorê muslumantiyê li ser Êzidî û Elewiyan ferz dikin.

Koma çete ya Feyleq El-Şam ên girêdayî artêşa Tirk a dagirker zarokên Êzidî yên gundê Basûfanê a navçeya Şêrawa ya Efrînê bi darê zorê rêdikin mizgeftan. Komên çete yên bi navê Ketîba El-Hemzet jî, dibistan û hin malên sivîl ên Elewiyan ên navçeya Mabeta dikin mizgeft û dibistanên Şerîetê. Hat diyar kirin ku kesên vê yekê qebûl nakin jî tên girtin, revandin û îşkence kirin. *R-5*

## Çeteyekî Feylq El-Şam hate kuştin



Li Efrînê çalakiyên şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê li dijî dagirkeran berdewam dikin. Odeya Çalakiya Xezeba Zeytûnê ragihand di çalakiye taybet a li herêma Cindirêsê pêk hat de, çeteyekî koma Feyleq El-Şam Mehmûd Ehmed Deban ê ji Idlibê ye hatiye kuştin. *R-2*

## Şengalî li dijî Hesen Xelîlê DAIŞ'î rabûn



Hukûmeta Iraqê kesekî bi navê Hesen Elî Xelîl ku tê gotin têkiliya wî bi DAIŞ'ê re heye û di dema komkujiya Şengalê de bi DAIŞ'ê re tevgeriyaye, ji bo Meclîsa Şengalê wezîfedar kir. Şengalî li ser vê yekê li navenda bajarê Şengalê daketin qadan û ji hukûmeta Iraqê xwestin ku vî kesî ji wezîfeyê bigire. *R-2*

## Kongreya Star ji bo jinan bang kir



Dewleta Tirk ya dagirker ku tecrîda girankirî ku li ser rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ferz kiriye di nava Kurd û dostên wan de rê li ber nerazîbûneke mezin vekiriye. Çalakiyên ji bo azadiya Ocalan berdewam dikin. Li Taxa Şêxmeqsûd a Helebê bi hezaran azadiya Ocalan xwestin. *R-2*

## Çolistana Dêrazorê bi tevahî hate rizgarkirin

Fermandariya Giştî ya QSD'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku di encama pêngava ku li du eniyan hatibû destpêkirin de tevahiya çolistana Dêrazorê hatiye rizgar kirin. di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Şervanên me bi sedan sivîl rizgar kirin, her wiha bi sedan sivîlên asê mabûn ji gundan derxistin û ji herêmên şer hatin dûrxistin. Di nava şer û pevçûnên ji her du aliyên Şedadê û Holê ku pêkhatin, şervanên me 418 terorîst, di nav de 16 emîr, kuştine û 29 terorîstên din jî dîl girtine. *R-2*



## KCDK-E banga tevlêbûna çalakiyan kir

Li tevahiya Ewropayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakî tên lidarxistin. Wê çalakiyên destpêkê di navbera 7-11'ê tebaxê de bi duruşmeya "Ji Ocalan re azadî" wê bên lidarxistin. KCDK-E'yê daxuyaniyek weşand û ji bo çalakiyên ku li tevahiya Ewropayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê pêk werin banga tevlêbûna girseyî û xwedîderketinê kir. *R-4*

## 4 leşkerên Tirk hatin kuştin

Li Amed û Colemergê di navbera hêzên gêrîla û artêşa Tirk a dagirker de şerên giran rû dan. Navenda Ragihandinê ya HPG'ê ragihand ku li Şemzînanê leşkerek û li Lîcê ya Amedê jî 3 leşkerên Tirk hatin kuştin. HPG'ê da ragihand ku di şerê dijwar de 2 gerîla jî şehîd bûne. *R-2*

Peymana Sewrê... R-6
Nikarin HDP'ê ... R-4
Muxalefet ev be ... R-5

# Gelê Helebê ji bo Ocalan rabû ser pêyan

***Dewleta Tirk ya dagirker ku tecrîda girankirî ku li ser rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ferz kiriye di nava Kurd û dostên wan de rê li ber nerazîbûneke mezin vekiriye. Çalakiyên ji bo azadiya Ocalan berdewam dikin. Li Taxa Şêxmeqsûd a Helebê bi hezaran azadiya Ocalan xwestin.***

Li taxa Şêxmeqsûd a Helebê li dijî dagirkeriya Tirkiyê û tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşek bi meşaleyan hate lidarxistin.

Hêrsa gelê Bakurê Sûriyê ya li hemberî dagirkeriya Tirkiyê û tecîrda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her ku diçe zêde dibe.

Bi pêşengtiya Yekîtiya Jinên Ciwan bi sedan şêniyên taxa Şêxmeqsûd a Hebelê meşeke bi meşaleyan li dar xistin. Di meşê de posterên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, alên TEV-DEM, YPG û YPJ hatin hildan. Her wiha pankartên "Em ê pergala Îmralî hilweşînin û bi rihê Berxwedana Serdemê ji bo azadiya Rêber Apo têbikoşin û bê serok jiiyan nabe" hatibûn vekirin.

Meş li qada Şehîd Destîna veguherî mîtîngê. Li ser navê Yekîtiya Jinên Ciwan Firyal Mihemed û bi navê Kongreya Star Heyfa Hesen axivîn. Di axaftinan de tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û bêdengiya raya giştî ya li hemberî kiryarên dewleta tirk hate şermezarkirin.

Kesên axivîn, bang li rêxistinên mirovî kirin ku erka xwe ya li hemberî Ocalan pêk bînin û sînorekî ji zêdegaviyên dewleta tirk re deynin. Mîtîng bi dirûşmeyan bi dawî bû…*ANHA*



## Şengalî li dijî Hesen Xelîlê DAIŞ'î rabûn



Hesen Elî Xelîl ku tê gotin peywendiya wî bi DAIŞ'ê re heye û ji bo meclîsa qezaya Şengalê hate tayîn kirin, rastî nerazîbûnên tund yên Şengaliyan hat. Şengaliyan li dijî vê yekê çalakiyek lidarxist. Hikûmeta Iraqê kesekî bi navê Hesen Elî Xelîl ku tê gotin têkiliya wî bi DAIŞ'ê re heye û di dema komkujiya Şengalê de bi DAIŞ'ê re tevgeriyaye, ji bo Meclîsa Qezaya Şengalê wezîfedar kir. Şengalî jî piştî bihîstina vê agahiyê li navenda bajarê Şengalê daketin qadan û nerazîbûn nîşan dan. Hejmareke zêde welatî beşdarê çalakiya nerazîbûnê bûn.

Şengalî bi dirûşmên, "Hesen Elî Xelîl DAIŞ'e, em wî di rêveberiyê de qebûl nakin", "Em rêveberiyeke nîştîmanî dixwazin" û "Yên xiyanet li Şengalê kirin, temsîla me nakin" qîriyan.

Xwepêşanderan daxwaz ji hikûmeta Iraqê kirin ku Hesen Elî Xelîl ji wezîfe bigire û guh bide daxwaza Şengaliyan.

Hesen Elî Xelîl beriya komkujiya Şengalê ya 3'yê Tebaxa 2014'an pêk were endamê meclîsa qezaya Şengalê bû. Li gorî agahiyên ji Şengalê hatine girtin, dîmen û belgeyên ku îspat dikin têkiliya vî kesî bi DAIŞ'ê re heye û di dema komkujiyê de rol lîstiye.

## Çeteyekî Feylq El-Şam hate kuştin



Odeya Çalakiya Xezeba Zeytûnê ragihand di çalakiye taybet a li herêma Cindirêsê pêk hat de, çeteyekî koma Feyleq El-Şam hate kuştin.

Odeya Çalakiya Xezeba Zeytûnê, destnîşan kir ku çalakiyên wan ên li dijî kesên êrîşên der mirovî li hember gel û dagirkeriya Efrînê de cih girtine dewam dike. Odeya Çalakiya Xezeba Zeytûnê ragihand di çalakiye taybet a li herêma Cindirêsê pêk hat de, çeteyekî koma Feyleq El-Şam Mehmûd Ehmed Deban ê ji Idlibê ye hatiye kuştin.

Odeya Çalakiyê kêlî bi kêlî dîmenên çalakiyê jî par vekirin.

## Çolistana Dêrazorê bi tevahî hate rizgarkirin

Fermandariya Giştî ya QSD`ê derbarê rizgarkirina tevahiya çolistana Dêrazorê de daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Daxuyaniya Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriyê Demokratîk QSD wiha ye:

″Hemleya me ya ji bo rizgarkirina bajarokê Deşîşa di 3'yê Hezîrana borî de, di çarçoveya dewamkirin û ewlekirina sînorê Sûriye-Iraqê de û rizgarkirina tevahî gundewarên parêzgeha Hesekê ji bermahiyên terorîstên DAIŞ'ê de dest pê kiribû û plankirina wê hemleyê bi hevrêzî li gel artêşa Iraqê û hêzên Koalîsyona Navneteweyî hatibû kirin. Hemleyê ji her du aliyên Şedadê û Holê ve dest pê kiribû û erdên bi rûberiya 7 hezar û 136 kîlometrekare û bi dirêjahiya 191 kîlometreyan li seranserî sînorê Iraqê di nava wê de jî bajarokê Deşîşa yê stratejîk û tevahî gundên girêdayî wê jî tevî rizgarkirina gundên girêdayî bajarokên Elsuwer û Merkede yên çema Xabûrê, her wiha deriyê Tel Sefûk jî hatibûn rizgarkirin. Hêzên me bi hêzên Iraqê re li ser sînor rastî hev hatin, bi vî awayî jî tevahî çolistana Dêrazorê hate rizgarkirin.

Şervanên me bi sedan sivîl rizgar kirin, her wiha bi sedan sivîlên asê mabûn ji wan gundan derxistin û ji herêmên şer hatin dûrxistin. Her wiha di wan gundan de ji bo astengkirina pêşketina şervanan gelek mayin û teqemenî ji aliyê terorîstên DAIŞ'ê ve hatibûn çandin, lê yekîneyên me yên endezyariya leşkerî ew mayin rakirin, her wiha şervanên me gelek tunelên binerd dîtin û bê bandor kirin.

Koalîsyona Navneteweyî jî bi awayekî çalak ji erd û ezman ve beşdarî operasyonê bûn.

Her wiha hêzên me rasterast bi terorîstan re ketin nava pevçûnan û di encamê de şerên dijwar qewimîn; tê de çekên giran û navîn hatin bikaranîn û terorîstan hewl da ku erebeyên bombebarkirî bi kar bînin. Di nava şer û pevçûnên ji her du aliyên Şedadê û Holê ve li dar ketine de, şervanên me 418 terorîst, di nav de 16 emîr, kuştine û 29 terorîstên dîtir jî dîl girtine.

Her wiha şervanên me gelek çek û cebilxaneyên DAIŞ'ê desteser kirin.

Her wiha di nava şer û pevçûnan de 4 şervanên me şehîd ketin û 22 jî birîndar bûn.″

## Li qadên rejîmê hilbijartin ew ê were kirin

Rayedarên Sûriyê ji bo hilbijartinên herêmî yên ku ew ê meha bê were kirin, bernamzetiya 35 hezar kesan qebûl kir.

Serokê Komîsyona Hilbijartinê ya Bilind Suleyman El Qaîd ji rojnameya El Watan a nêzî rejîmê re axivî û got, "Komîteyên ji namzetan berpirsyar, ji nav 55 hezar serlêderan a 34 hezar û 553 kesan qebûl kir. Ew ê namzet ji bo 18 hezar û 478 kursiyan têbikoşin."

Li Dêrazor, Dera û Hesekê ew ê hilbijartin neyê kirin. Nîvê rojavayê Dêrazor di bin kontrola rejîmê de ye û beşeke zêde ya herêmê di bin kontrola QSD de ye. Rejîmê meha borî hemû herêma Derayê bi dest xist.

Li gorî ajansa nûçeyan a Sanayê ji bo bajarê Hamayê hikumet dikare navendeke hilbijartinê ya taybet ava bike. Rejîm bi vê rêyê hewl dide li Îdlîb û Reqayê namzetên potansiyel diyar bike. Îdlîb di bin dagirkeriya çeteyên Tirkiyê de ye û li Reqayê jî ya ku ji aliyê QSD'ê hatibû azadkirin jî rêveberiyên herêmî hatine avakirin.

Hilbijartinên giştî yên li Sûriyê di sala 2016'an de hatibû kirin û Başar El Esad ji bo heft salan dîsa hatibû hilbijartin.

Hilbijartinên herêmî ew ê di 16'ê Îlonê de pêk werin. Li gorî Sekreterê Giştî yê Meclîsa Herêmî ya Şamê Başar Al Haffar ew ê berpirsyariya meclîsan were zêdekirin.

## 4 leşkerên Tirk hatin kuştin

Gerîlayên HPG'ê li girê Harûna a Şemzînanê ya Şirnexê û li qada di navbeyna Lîcê û Hênê ya Amedê de 4 leşker kuştin. Di şerê dijwar de 2 gerîla jî şehîd bûn.

Navenda Ragihandinê ya HPG'ê ragihand ku li Şemzînanê rêze çalakiyên sekvanî kirine, li bejahiya Licê-Hênê bi yekîneyeke leşkerî ya xef re şer çêbûye. Li gorî daxuyaniyê li Şemzînanê 1 û li Amedê 3 leşker hatin kuştin.

Daxuyaniya HPG'ê wiha ye: ''Di çarçoweya Pêngava Şoreşger a Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî 7'ê Tebaxê saet 18.30'an li Colemêrg Şemzînanê, li dijî artêşa TC'ê ya dagirker, li girê Garûn rêze çalakiyên sekvanî pêk anîne. Di çalakiyê de 1 leşker hatiye kuştin û 1 jî birîndar bûye.

Roja 1'ê Tebaxê artêşa TC'ê ya dagirker di navbeyna navçeyên Licê û Hênê de, li qada Şehîd Rojhat, li mintiqeya Bekira, Elîka, Dîrkam, Elnexîr û Serdê bi desteka yekîneyên xef operasyon daye destpêkirin. 2'yê Tebaxê saet 20.30'an di navbeyna hêzên me û van yekîneyên xef de şer derketiye. Şer heta 3'yê Tebaxê sibehê dom kriiye û di encamê de 3 leşkerên dijmin hatine kuştin û gelek jê birîndar bûne.

**DU GERÎLA ŞEHÎD BÛN**

Di şer de hêzên dagirker bi desteka amûrên hewayî yên bêmirov qad gelekî bombe kirine. Hevrêyên me Şahîn Amed û Azad Rojhilat ku heta ku bi guleya xwe dayî li dijî dijmin şer kirin şehîd bûne. Agahiyên nasnameyê ya hevrêyên me yên şehîd wê bi raya giştî re werin parvekirin.''



# Em ê ala Aram Tigran timî bilind bikin

***Hunermendê Kurd Aram Tîgran di 8'ê Tebaxa 2009'an de li paytexta Yunanîstan Atîna yê çû ser dilovanviya xwe. Bo boneya salvegera wefata Aram Tigran TEV-ÇAND'ê peyamek weşand û Aram Tigran bi bîr anî. TEV-ÇAND'ê di peyama xwe de diyar kir ku ew ê ala hunermendê mezin Aram Tigran timî bilind bikin.***

Tevgera çandê TEV-ÇAND'ê, hunermend Aram Tîgran di 9'emîn salvegera wefata wî de bîr anî. TEV-ÇAND'ê, bi boneya 9. Salvegera wefata Aram Tîgran peyamekî nivîskî weşand. Di peyamê de wiha tê gotin, "Em careke din hunermendê Mezin Aram Tîgran ku li penaberiyê ji dayik bû û li penaberiyê mir lê belê destûr nedan ku kula dilê wî li Amedê bê vaşartin, bi rêzdarî bibîr tînin."

Aram Tîgran, 53 salên xwe yên muzikjeniyê de nêzî 500 stran hilberandin û şirove kirin. Aram Tîgran, di komkujiya Ermeniyan a di sala 1915'an de ji hêla dewleta Tirk a dagirker ve hatî kirin de ji bilî dê û bav, hemû xizmên wî hatibûn kuştin. Malbata wî ji ber kumkujiyê neçar mabû ku koçî Qamişlo bike. Tîgran di sala 1934'an de li Qamişlo hate dinê û ji hêla malbateke Kurd ve hate xwedîkirin û li ser wesiyeta bavê xwe stranên kurdî gotin.

TEV-ÇAND'ê anî ziman ku wefata Aram Tîgran ji bo hunera kurdî windahiyeke mezin bû û wiha hat gotin, "Lê belê bi berhemên ji me re hiştî, bi felsefeya xwe ya jiyanê ji bo nifşên nû mînakeke mezin e. Em bi vê wateyê mamosteyê mezin careke din bibîr tînin. Pêdiviya bi dilsoziya bîranîna wî re ew e ku em ala ji me re hiştî bilindtir bikin û wî nemir bikin. Bi vê boneyê em carek din li ber bîranîna wî bejna xwe ditewînin û bi minet û rêzdarî bibîr tînin. Aram Tîgran hunermendekî mezin ê Kurdî bû."



## Berhemên Aram Tîgran hêz û çavkaniya me ye

Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê bi daxuyaniyekê hunermend Aram Tîgran bi bîr anî.

Bi wesîleya salvegera koça dawîn a hunermend Aram Tîgran, Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Rojavayê Kurdistanê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Daxuyanî wiha ye:

″Em nemir Aramê Tîgran bi bîr tînin. Şopa reseniya hunera wî di nav me de cih girtiye. Keda ku wî daye hunera kurdî bi hestyarî em ji bîr nakin, stran û berhemên wî ji me re bingeha hunerê ne, kaniya hestên wî heta îro di nava me de diherike.

Bîranîna nemir Aram hestên reseniyê di me de dilivîne, xewn û xeyalên wî îro bi hişmendiya neteweya demokratîk bi war dibe. Hemû kom û hunermendên TEV-ÇAND`ê ji berhema eşqa strana Ey Welato hunerê vedixwin. Li ser şopa xewn û xeyalên hunermendê nemir birêxistinbûn û sazîbûn ji me re bicihanîna hezkirina welat e û hemû berhemên heyberî û hestyarî ye.

Stîla evîn û eşqa rûpelên Aram Tîgran di strana kurmancî de danasîna civak, ax, ezman û evîna keç û xortan e. Hemû hunergeh û komîteyên muzîkê di çêkirina berhemên hunerî de stîla gotin û muzîka mamoste Aram esas digirin.

Di nav tevliheviya kirrîn û firotina hunerê de, di hunerê de xirakirin çêbûye û li gelek cihan şûna hunerê kavil maye, lê berhemên wekî berhemên Aram Tîgran ji me re mertal in li hemberî erebêskbûnê û ezeziyê.

Hemû kar û xebatên me ji bo hunera resen û civakbûyînê ne û nemir Aram bi xwe jî yek ji wan kesan ku herî zêde nûnertiya parastin û pêşxistina reseniya civakên Kurdistanê kiriye. Xwedîderketina li kesên wekî nemir Aram ji me re erkeke hunerî û rêxistinî ye.

Em her dem wî bi bîr tînin û di dil û mêjiyê me de wê her tim zindî bimîne."

## Piştî rizgarbûnê mîhrîcana yekemîn



Bi durûşmeya 'mîhrîcana dildariyê û jiyana hevbeş' Muduriyeta Turîzmê ya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a herêma Tebqayê, di demeke nêz de Mîhrîcana Kirrîn û Firotina Pêdiviyên Binemalî li Tebqayê cara yekemîn piştî rizgarkirinê organîze dike.

Bi armanca jiholêrakirina bandorên neyînî û tarî yên çeteyên DAIŞ'ê û her wiha ji bo çalakkirina tevgera bazirganiyê ya ku piştî rizgarkirina Tebqayê li bajarê geş bûye, wê mihrîcan bê lidarxistin.

Têkildarî mijarê hevseroka Muduriyeta Turîzm û Parastina Şûnwaran Nicûd El-Bayie wiha got: "Mîhrîcan di 12'ê Tebaxê de wê dest pê bike û tê de gelek çalakiyên hunerî û bazirganî wê pêk werin."

Nicûd diyar kir ku gelek firoşkarên cil, madeyên xwarinê, xwaringeh û alavên malan wê beşdarî mîhrîcanê bibin.

Hevseroka Muduriyeta Turîzm û Parastina Şûnwaran Nicûd El-Bayir destnîşan kir ku bi hevkariya Şaredariya Gel a Tebqayê amadekariyên mîhrîcanê dikin, cihê mîhrîcanê li taxa duyemîn sererast dikin û peyarêyan piştî sererastkirinê boyax dikin û her wiha Komîteya Çand û Hunerê çavdêriya amadekariyên hunerî dike.

Heta niha Muduriyeta Turîzmê daxwaznameyên beşdarbûnê ji bazirganan digire û ji bo eyerkirina cihê wan di mîhrîcanê de dixebite.

Piştî ku şervanên QSD'ê bajarê Tepqayê di 10'ê Gulana 2017'an de ji DAIŞ'ê rizgarkirin ev mîhrîcana yekemîn e tê lidarxistin…*ANHA*



## Hunermend divê bi dîsîplînek mezin bijî

Rotînda YETKÎNER

Sala 1991 ji bo bakurê kurdistan di warê huner û çandê de weke miladekêye. Tekoşîna azadiye weke her qadê cîvakê, badorek mezin da ser çand û hunerê jî. Ez ji wan kesên bi şansim qu di dameziranadina NÇM de min cîh gir. NÇM taybe ji bo Kurdistana bakur wekê cîhek pîroz û saziyek bêhepa bû. tekoşîna Azadiyê bi cangorîtiyên hezar hevalan qada huner û çandê ji bin badora neyînî a dijmin derxistibû û înkara û qedexeya qirej êdî bi NÇM bê mene dima.

Ew dem em xebatkarê NÇM dibekû bi kurahî me Tevgera Azadî û zilma dijmin baş nedinasî, le her hevalek baş dizanî ku ger em wek gerîlla bi cangorîtî lî çand û hunera gel xwedî dernekevin, wê ev sazî bikeve bin badora sîxur û xayinan. Lewma jî me xwe wek gerîllayên çand û huner didît û di demek kurt de saziya me li tevahî bakur û li bajarên tirkan gelek badore mezin afirand. Ez minak bidimm, tişteku hati serê min bawerim gelek hevale me yên wê demê jî bi vê rengê zilma dijmin dîtin. Gelek car ji aliyên polesên tirkan hatim binçevkirin û tênê ji min re digotin: " tu hunerê bike û ji ve saziya (terorîst! ) dur bisekine an na emê te wedakin"

Lê NÇM hê wê dem berhemên ber çav jî neafirandibû, dijmin dizanî ku ger em bi disiplîna gerîlla û bi terbiya hunerê kar bikin, wê di paşerojanda ev sazî badorek mezin çeke.

Divê mînakê de min xwest bînim birya me ku em îro din ava ewqas îmkan û derfetên mezin de, nikarin hunera resen biafrînin ji ber ku takekesî bi reya ruhê arabekê tevahî sazî û dezgehê me bê zar hiştiye.

En ku 1991heya 1994 li NÇM kar kirine baş dizanin, me rojê du dan xwerin dixwar, me digot: "ji ber ku gerîlla di zurufen pir dijwarda têdikoşe û bi rojan birçî dimine, dive em jî usabin". Ev fikrandina me ne tiştekê erzan an jî radîkal bû, me bi vê rengê nefsa xwe kontirol dikir û me nedihîşt takekesî an jî arabesk bête nava me. Binerin û lekolîn bikin wan salan de NÇM berhemên her bi bador û li gor amatoriya xwe gelek serkeftî berheman afrandiye.

Takekesî mala huner û çande werankiriye, ruhe asê kirye kole û buye berdestê arabeska gemar. Mixabin îro ro ji bo kada çand û hunerê divê ew ruhê NÇM 1991 an pêpîste.

Her ku takekesî ket nava qada hunera me, em ketin bin bador çanda dijmin û geek ji me bun popilîs, doş bûn xwe wedakirin û dawî de bun bela serê civakê. Bi stranên ruh arabek û erzan goh li gohdaran qirêjkirin. Konser, şev, şahî, şîn, bîranînên ŞEHÎDAN, dewet tev bûn wek hev û nema tema hunerê.

Bi heviya guhertinên mezin û bi ruhê şoreşgerî ji takakesî û arabeske azad buyîna me…

# Welatiyên Çiyayê Kezwanan alîkariyê dixwazin

**Gelê herêma Çiyayê Kezwanan ji ber kêmbûna ava şirîn, xerabûna rêyan û ji ber nebûna navendên tendurustiyê û bijîşkan bi gazinc in. Hevserokê Şaredariya Çiyayê Kezwana Saleh Medîne Xilêf diyar kir ku piştî herêm hat rizgarkirin rewş aram buye jî lê pirsgirêkên jiyanî yên di berê de jî mane berdewam dikin.**



Gelê herêma Çiyayê Kezwana ji ber kêmbûna ava şirîn, xerabûna rêyan û ji ber nebûna bijîşkan bi pirsgirêkên mezin re rû bi rû ne. Hevserokê Şaredariyê Saleh Medîne Xilêf bang li rayedaran kir ku alîkariyê bidin wan.
Pirsgirêkên sereke yên herêma Çiyayê Kezwanan nebûna ava şirîn, nebûna kar, xirabûna rêyan û nebûna derfetên tenduristiyê ne.
Derbarê mijarê de Hevserokê Şaredariya Çiyayê Kezwana Saleh Medîne Xilêf axvî û diyar kir ku her çendî piştî rizgarkirina herêmê jiyan asayî bûye jî lê hê gelek pirsgirêkên berê de mane dewam dikin. Xilêf wiha got, "Yek ji pirsgirêkên sereke nebûna avê ye. Herêma Çiyayê Kezwana herêmek çol e. Bi giştî li 2 herêmên wê ava şirîn heye. Dema şaredarî bixwaze ji bo ava vexwarinê bîran bikole jî ava tehl derdikeve. Di dema rejîmê de jî bi stêrên avê av digihîşt herêmê. Av niha ji herêma Til Temir tê, şaredarî 5 bermîlan bi hezarî dide gel."
Xilêf destnîşan kir ku tenê 2 stêrên avê yên şaredariyê hene û wiha got: "Av ji dûrahiya 70 km tê herêmê. Ji ber kêmbûna stêran av nagihîje hinek gundên dûr. Ew ji xwe re avê dikirin Tenê du gund bîrên ava şirîn lê hene, ew jî têra herêma wan dike."
Xilêf anî ziman ku eger şaredarî alîkariya wan bike û li herêmên ava şirîn bîran bikolin dibe ku avê bigihînin hemû herêmê.
Pirsgirêkeke din jî xirabûna rêyên di nava gundan de ye.
Hevserok Xilêf da zanîn ku di şer de piraniya rêyên herêmê xirab bûn, rêyên mayî jî ji ber barana îsal a di meha havînê de xirab bûn û wiha axivî: "Rêya di navbera bakur û başûrê Çiyayê Kezwanan de, rêya di navbera Dêrazor, Raqa û Çiyayê Kezwanan de hemû xirab bûne. Rêya Sebi Zilam ku 12 gundan digihîne hev, rûxiyaye, em nikarin stêrên avê bibin herêmê. Em wek Şaredariya Çiyayê Kezwanan nikarin vê pirsgirêkê çareser bikin, ji ber ku alav û erebeyên kar di destê me de tune ne. Me ji rêveberiya şaredariyan a Til Temir re ragihand lê heta niha tu bersiv nedane me."
Yek ji pirsgirêkên sereke yên herêma Çiyayê Kezwanan jî nebûna klînîk, bijîşk û dermanxaneyan e. Şaredariyê ji bo tenduristiyê odeyek di nava avahiya xwe de vekiriye, lê li herêmê bijîşk tune ne. Bijîşkên heyî jî ji ber dûrbûna herêmê nêzî 400 hezar lirayan dixwazin. Çiyayê Kezwanan 50 km ji Hesekê û 30 km jî ji Til Temirê dûr e, dema kesek nexweş dikeve heta digihîje nexweşxaneyê pir dem derbas dibe û kirya rê jî zêde dibe.
Hevserok Saleh Medîne Xilêf bang li rayedaran kir ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên gel alîkariyê bi wan re bikin…*ANHA*

# Bi armanca alîkariya cotkaran projeyên nû



**Gulbîn BOZO**

Axa Rojavayê Kurdistanê di warê çandiniyê de, axeke dewlemedn e, taybet wekî çandiniya genim, cih û nîs de madeyên serkene û wekî aboriay stratîjî tê binvakirin. Lê belê ji ber nebûna rûbaran û kêmbûna asta barîna baranê, sektora çandiniyê zirar dîtiye û xelk ji bo avdana erdên xwey çandiniyê bi neçarî berê xwe dane kolandina bîrên avê. Ji bo ku cotkara ji erd û axa xwe zêdetir sûd werbigrin Desteya Çandinî û sewladaran a bajarê Dêrikêç hin tedbîr û projeyên nû ji ho alîkariya cotkaran avadikin.
Têkîldarê mijarê rojnameya me serdna navenda çandinî ya bajarê Dêrikê kir û Selah Hemza diyar kir ku bi armanca ku çareserkirin pirsgirêk û alîkirina cotkaran, her wiha girtina hilbîrnek baş peojeyên nû avadikin."

**REWŞA HEWAYÊ ZERAR DA ZEVIYAN**

Endamê Navenda Çandiniyê Selah Hemza ser sedema kêm hilbirîna genim, nok, ceh û nîsk wiha got: "Di mewsimê 2018'an de ji sedema kêm barîna baran û di biharî de zêde barana barî encamên wekî ritubet (wexim) bû sedema ku gelek nexeşî li zeviyan ket û ji bo wê hilbirîna genim li piranî bajarên Herêma Cizîrê heya asteke kêmbû. Lê bajarên mîna Dêrikê û gundên derdorê erê ne mîna salên derbasbûyî lê, heya asteke başbû. Tevkî ku îsal nêzî 10 hezar hîktar ji cureyên erzaq hate çandin, wek ku me di destpêkê de diyar kir ji sedemên hewayê hilbirîna wê kêm hat. Her wiha gelekî girînge dema cotkar zanibe bê kengî û çawa zeviyê xwe semad bike, da ku zerarê nede zeviyan. Ev jî sedemek xwe heye ku zevî nexweş bikeve û hilbirîne ne baş be."

**ALÎKARÎ JI BO COTKARAN DIKIN**




Selah bal kişand ser alîkirina cotkaran û wiha got: "Navenda Çandinî û Kedîkirina Sewalan, dermanên ji bo zevî û hemû cureyên şînkahiyê li hemû dermanxane û bazaran hate bi cihkirin, her wiha da ku bazirgan keysbaziyê li cotkaran neke dê diriya komînan ev dermanan li gorî formayên cotkaran û rûbariya erdê wan bê belavkirin. Di heman demê de tovên ku li bazaran di hate peydakirin, ji bo çandiniyê nebaşbûn, ji bo ku em vê pirsgirêkê çareser bikin wekî navend nêzî 2300 hemû cûreyên tov di riya dermanxaneyan û komînan wekî alîkarî ji cotkaran re li gorî pêwîstiyan wan hate belav kirin."

**GENIM ABORIYA ISTIRATÎJÎKE**


Selah Hemza bangeke li hemû cotkaran kir ku çi astengî û pêwîstiyên wan hebe Navenda wan ji wanre vekirîye û wiha got: "Da ku hilbirîneke başbe bê kirin, her wiha alîkarî bi cotkaran re bikin, avên rezaz û semad li gorî rewş û hewcedariya edr û zeviyê dê bê dayîn. Pêwîste em xwedî li aboriya xwe derkevin û genim jî di Herêma Cizîrde wekî aboriyek istratîjîk tê dîtin."

**27000 TON GENIM HATİYE KIRÎN**

Selah diyar ku Desteya Çandinyê û Sewaldariyê komîteyek ji bo çavdêriya buhayên şînkahî, semad û tov komîteyek ji 15 kesan avakiriye û wiha bi dawî kir: "Li Dêrikê 3 navendên kirîna genim hatin vekirin ku heya niha 27000 ton genim hatiye kirîn. Bi armanca alîkariya cotkaran Desteya çandinyê destûr da cotkarên ku nêzî Seda Borz û Hekîma bin dikarin avê bikşînin û erdê xwe avbidin."

# Li Til Tewîl navenda tenduristiyê tê vekirin

Şêniyên bajarokê Til Tewîl ê bajarê Hesekê daxwaza vekirina navendeke tenduristiyê kirin. Rêveberên Komîteya Tenduristiyê ya Hesekê diyar kir ku di demeke nêzîk de wê navend were vekirin.
Bajarokê Til Tewîl 5 km dikeve bakûrê bajarê Hesekê, hêjmara niştecihên wê 5 hezare û Kurd û Ereb in. Her wiha 24 gund jî girêdyaî bajaroke.
Şêniyên bajarokê Til Tewîl ji ber tunebûna dermanxane û navenda tenduristiyê bêzar in, ji ber vê yekê neçar dimînin ku biçin navenda bajêr.
Welatiyê bi navê Hindî El-Xelef got. "Dermanxaneyeke biçûk hebû, ew jî hate girtin, niha em zehmetiyan dikişînin, ne dermanxane û ne jî navendeke tenduristiyê heye. Em bi hêvî ne ku navendeke tenduristiyê were vekirin."
Welatiya bi navê Emîna El-Elawî jî anî ziman ku ji ber tunebûna dermanxane û navenda tenduristiyê ew neçar dimînin ku biçin bajêr û wiha got: "Dderman û tedawiya bijîşkan jî biha ye."
Welatiyê bi navê Eymen Tariq jî anî ziman ku bajar 5 km dûr e, di rewşên nexweşiyên giran de xetere çêdibe, li aliyekî din jî di saetên derengî şevê de wesayît tune ne.
Hevserokê Meclisa Bajarokê Til Tewîl Xebat Silêman anî ziman ku mehane civîn têne lidarxistin û daxwazên gel têne guhdarkirin û wiha got: "Em bi zehmetiyên şêniyan dizanin. Wekî meclis me daxwaza vekirina navendeke tenduristiyê pêşkêşî Komîteya Tenduristiyê ya bajarê Hesekê kiriye."
Tê payîn ku di demeke nêzîk de navendeke tenduristiyê li Til Tewîl were vekirin.
Komîteya Tenduristiyê ya Hesekê di nava 6 mehan de navendên tenduristiyê li navçeyên Zergan, Mergeda, Hol û Erîşê vekirine…
*ANHA*



**EW ROJ**



## Peymana Sewrê 10'ê Tebax 1920

**Farûq SAKIK**

Di Şerê Cihanê yê Yekem de dû blokên mezin, Bloka Antant yanê Brîtanya, Fransa, Îtalya û Rûsya û Bloka hevpeyman yanê Almanya, Tirkiye û Awistirya, bihevketibûn.
Di encama şerê ku çar salan ajot de, Brîtanî û hevalbendên wan biserketin û împaratoriyên mezîn yên wek Osmanî, Alman-Awistirya û Rûsya têk çûn û ji holê rabûn. Li ser xaka van imparatoriyên têkçûyî dewletên nû peydabûbûn.
Xaka Osmanî jî jihev belavbûbû û ji bilî Kurdan hemû netewên din ji împaratoriyê veqetiyabûn. Li ser mîrata mayî jî di bin serokatiya Mistefa Kemal de komarekî hatibû sazkirin.
Lê gelek pirs û pirsgirêk hênjî di domiyan. Kurdistan di navbera Tirk, Brîtanî, Frensî û Farisan de mabû.
Brîtanya li Rojhilata Navîn li pey dengeyên nûh bû. Ji bo wan an perçekirina xaka Osmanî an jî dostaniya Komara Kemalîst lazim bû. Ji ber vê yekê diveyabû ew lihev rûniştana û nakokî û pirsgirêkên xwe çareser bikrana.
Di destpêka şerê cihanê ê yekê de, di sala 1916an li gor biryarên peymana Saykes-Picot dewletê Antant li ser parvekirina dewleta Osmanî li hev kirin. Şertên wê, çend bajarên Anadoliyê ne tê de, temamê herêmên dewleta Osmanî dixist bin nifûza dewletên Antant.
EWROJ.....
Şertên peymana Sewrê gelekî elastîk hatibûn hazir kirin. Ew ji bo bazarek di dema pêş de hatibûn hazir kirin. Bi taybetî xalên derheqê pirsa kurdî bi hin egeran ve hatibûn girêdan.
Peymana Sewrê ku naveroka wê di 24ê Nîsana 1920an de di Konferansa San Remo de hatibû amadekirin di 11 Gûlana 1920an de ji bo lêkolînê şandin Hikumeta Osmaniyan.
Tirkî jî wek dewletek di şerî de şikestî, mecbûr bû ko li gor şertên dewletê Antant peymanekê imze bike. Piştî hin nîqaşan dewleta Osmanî neçar ma ku vê Peymanê bipejirîne.
Ew peymana Sewrê di 10ê Tebaxa sala 1920 de li nêzikî Parîsê li bajaroka Sewrê di nav hikûmetên Antant û Tirkiyê de hat imze kirin.
Di vê peymana ku bêxwedî mabû de hin mafên netewî yên Kurd û Ermeniyan hatibû naskirin. Li gor Peymana Sewrê li ser xaka Împaratoriya Osmanî dewletên Kurdistan û Ermenistanê dihatin damezrandin.
Bendên Peymana Sewrê yên 62, 63 û 64an, damezrandina Kurdistaneke serbixwe destnîşan dikirin. Benda 62an Kurdistanê wiha tarîf dikir:
"Devera di navbera rojhilatê Firadê, başûrê Ermenîstanê, Tirkiyê û Sûrî, yên ku tixûbên wan wê di pêşerojê de bên diyarkirin û herêmên ku Kurd tê de piranî ne."
Ev herem wê di destpêkê de di bin ewlekariya Brîtanya, Fransa û Îtalya de wek herêmeke xweser bimana. Benda 64an ya Peymana Sewrê jî wiha bû: "Gelê Kurd, yanê gelê herêmê ger bi piranî daxwaz bike ku ji Tirkiyê bi tevahî veqete û serbixwe bibe û serî li Civata Gelan bixe û Civat baweriya xwe pê bîne ku kapasîta vî gelî, ya damezirandina dewleteke serbixwe heye û damezirandinê qewêtî bike, Tirkiyê garantî dide ku ji bo damezirandina vê dewletê dev ji hemû mafên xwe berde."
Dawiya beşa vê peymanê jî wiha bû: "Ger piştî damezirandina dewleta serbixwe ya Kurdistanê, Kurdên wilayeta Musulê, ku beşek ji Kurdistanê ye, daxwaz bikin ku tevlî Kurdistanê bibin, li hember vê yekê wê hîç îtîraza hêzên hevalbend nebe."
Li alî din piştî serkeftinên leşkerî, Kemalîstan çavê xwe berdabûn Başûrê Kurdistanê jî ku di bin dagira İngîlîzan de bû. Yanê pêdiwî hebû ku Komara Kemalîst bihata sînorkirin û ehlîkirin.
ÎROJ....
Ji bona têkbirina peymana Sewrê û amadekariyên konferanseke nuh Tirkiyê û dewletên Antant dest bi pêwendiyên dîplomatîk ên nuh kirin. Ev peymana nû, Peymana Lozanê bû. Bi vê peymanê Kurdistan bû 4 parçe. Sînor û xet di navbera kurdan de hatin xêz kirin. Îroj kurd ji bo van sînora parçebikin û ji bo Kurdistanek azad, têdikoşin.



# Alozî bi danûstandinan çareser dibe

***Cîgira serokê Buroya Partiya Sûriya Pêşerojê ya herêma Şebayê Ehlam Xidro diyar kir ku çareseriya aloziya Sûriyê bêyî destwerdanên derve bi danûstandina gel û hêzên Sûriyê wê pêk were. Ehlam wiha got, "Sûriye buye meydana şerê hêzên navnetewî. Ji bo aloziya Sûriyê bi dawî bibe danûstandinên Sûrî-Sûrî girîng in."***




Cîgira serokê Buroya Partiya Sûriya Pêşerojê ya herêma Şehbayê Ehlam Xidro destnîşan kir ku mudaxeleyên derve Sûriye xistine tuneleke tarî û diyar kir ku bidawîbûna aloziyê bi danûstandinên Sûrî-Sûrî pêkan e.
Cîgira serokê Buroya Partiya Sûriya Pêşerojê ya herêma Şebayê Ehlam Xidro bal kişand li ser aloziya Sûriyê ku ket sala 8'an wiha axivî, "Aloziya Sûriyê ketiye sala xwe ya 8'emîn. Di encama mudaxeleyên derve de bûye meydana şerekî mezin ê navdewletî, Sûriye xistine tuneleke tarî, bi taybet piştî ku dagirkeriya Tirkiyê destek da komên çete."
Ehlam da xuyakirin ku gelê Bakurê Sûriyê û Partiya Sûriya Pêşerojê piştgiriyê didin danûstandinên Sûrî-Sûrî û wiha pê de çû: "Em li dijî nîjadperstiyê ne, banga me hevgirtin û yekitiya gelê Sûriyê li hemberî terorê ye."
Ehlam di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Piştî ku gelê Bakurê Sûriyê kerwanek ji şehîdan da û welat ji çeteyan rizgar kir, zemîna diyalogan peyda bû ku xebatên çareseriya siyasî bêne destpêkirin."
Ehlam Xidro vexwendina rêjîma Sûriyê ya ji bo MSD'ê gaveke erênî ber bi çareseriya siyasî ve nirxand û wiha got: "Lihevkirina gelê Sûriyê bi danûstandinên niştimanî dûrî mudaxeleyên derve wê pêk werin."…*ANHA*

# Ocalan kilîta çareseriya şer û aloziyan e

Jinên ji Qamişlo destnîşan kirin ku berdewamkirina tecrîda giran li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê aloziyê kûrtir bike. Ji ber Ocalan kilîta çareseriya şer û aloziyên li herêmê ye. Dewleta tirk tecrîdeke giran li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ferz kiriye û bi hincetên nahêle ku malbat û parêzer biçin bi Ocalan re hevdîtinê bikin.
Girêdayî mijarê jinên Qamişlo nêrîn û helwestên xwe anîn ziman û tecrîd şermezar kirin. Jinan diyar kirin ku ew ê li dijî van kiryarên dewleta Tirk ji bo azadiya Ocalan têkoşîna xwe bedewam bikin.
Dayika bi navê Etiye wiha got: "Dewleta tirk ji sala 2011'an ve tecrîd li ser Rêber Abdullah Ocalan ferz kiriye û hemû qanûn û peymanên navdewletî binpê kiriye. Nahêlin parêzer û malbata wî biçin wî bibînin." Dayîka Etiye diyar kir ku berdewamkirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, berdewamkirina alozî û şerên Rojhilata Navîn e û got, "Ji ber ku Ocalan kilîta çarseriya aloziyên Rojhilata Navîn e. Ocalan azadî û wekheviya hemû gelan dixwaze. Heta rizgarkirina Ocalan em dest ji çalakiyên xwe bernadin."





Dayîka Ereb Lemîs El-Hebîb jî diyar kir ku Ocalan rêberê yekemîn e ku ji bo azadiya jinan têdikoşe û da zanîn ku cihêkariya ku sîstemên zordest li nava gelan çandibûn ji holê rakir. Dayika Lemîs wiha dewamkir: "Piştî Şoreşa Rojava bi saya fikr û felsefeya Ocalan, jinan karî maf û azadiya xwe bi bistînin." Lemîs bêdengiya rêxistinên mafên mirovan li hemberî kiryarên dagirkeriya jî şermezar kir…*ANHA*

# Kongreya Star li Şehbayê bi jinan re civiya



Di çarçoveya rêzecivînên ku Kongreya Star bi armanca şîrovekirina biryarên Konferansa Duyemîn a Kongreya Star a ku li herêma Şehbayê hatibû li dar xistin, du civînên cuda li gundên Keştar û Bênê yên girêdayî navçeya Şêrawa ya Efrînê li dar xist. Dehan jinên gundên Keştar û Bênê tevlî civînê bûn. Endama Kongreya Star a Kantona Efrînê Fatma Lekto armanca civînan şîrove kir û wiha got: "Bi armanca şîrovekirina biryarên Konferansa Duyemîn a Kongreya Star a ku di 26'ê tîrmeha borî de bi tevlîbûna 500 delegeyan hat lidarixistin, em rêzecivînan li gundên navçeya Şêrawa û deverên Şehbayê li dar dixin."
Piştre encamnameya konferansê hate xwendin. Di encamnameyê de biryarên konfernsa duyemîn, rewşa siyasî, rêxistinî û her wiha rola jinê di berxwedana serdemê de, hatin şîrovekirin…ANHA

# Denîz hovîtiya DAÎŞ'ê ji cîhanê re ragihand

MKGP'ê nûçegihan Denîz Firat ku di êrîşeke DAÎŞ'ê de şehîd bûbû, bi bîr anî.
Platforma Nûçegihanên Jin ên Mezopotamyayê (MKGP) derbarê nûçegihan Denîz Firat ku 8'ê Tebaxa 2014'an di êrîşeke DAÎŞ'ê de ya li ser Mexmûrê şehîd bûyî daxuyaniyeke nivîskî da.
Di daxuyaniyê dde hate bibîrxistin ku 4 sal di ser şehîdbûna Denîz Firat re derbas bûne û wiha hate gotin, ''Denîz ku heta kêliya dawî ya jiyanê jî kamera xwe ya xebitandiye, hovîtiya DAÎŞ'ê ji hemû cîhanê re ragihandiye, li cografyaya Rojhilata Navîn ku faşîzmê xwe aniye asta bilind, nîşanî wan jinan daye ku piştî wê rahiştine alê, bi berxwedanê mirov dikare bi ser bikeve."
''Ji bo me xebatkarên çapemaniya azad ku şopdarên Deniz in, bersiva ji bo Denîz Firat ku di çîroka dem kurt a jiyanê de, ya ji Wanê heta bi Mexmûrê rêwîtiya dirêj vegotî, wêrekî, vîn û berxwedan e. Em di salvegera 4'an a mirina Deniz de wê bi hurmet bi bîr tînin, em careke din ji zindanan, meydanan û qadên şer dibêjin ku mîrateya wê, wê rêya me ronî bike."

# Ji sedî 75 jin komînê birêve dibe



**Melek DEMÎRTAŞ**

Komîn civakê bi rêxistin dike û kevirê bingehîn yê avakirina Fedraliya Bakurê Sûriyê ye, ji ber ku bingha Netewa Dîmokratîk û nûnertiya azadî, wekhevî û edaletê dike. Her wiha rol û misyona jin di komînê de ya herî çalake, ji ber ji sedî 75 jin komînê birêve dibin. Ev 5 salin ku komîn hatiye avakirin û gelek pirsgirêk çareser kirin û xebat dane meşandin.
Têkîldarê mijarê Hevseroka Komîna Ş.Lewend a taxa Bişêriyê Mêrvet Ibrahîm diyar kir ku komîn sîstemek komînalî ye, yek ji bo herkesî û herkes ji bo yekî di xebite."




**KOMÎTE Bİ ERKÊN XWE RADIBİN**

Hevseroka Komîna Ş.Lewend Mêrvet Ibrahîm da zanîn ku ev nêzî salek ser hilbijartina komînan derbasbû, destpêkê me komîtên xwe ku ji 10 komîtan pêk tên çalak kirin, piştre serdna hemû malan kir û civînek giştî ser sîstema nû ya komînan çêkir. Û wiha pêde çû: "Ku her komîte bi erkên xwe radibin, komîta kar ûbarê civakê û xizmetguzarî belavkirina mazot, xaz, paqijî, taybet alîkariya welatiyên efrînê di milê madî û manewî de. Çi peyda kirina kar û xanî ji wan re. Komîta jin jî her hefte da ku em pirsgirêk û hewcedariyên jin çine ji nêzve bizanibin heftana serdana malan bi taybet malên Efrînê dikin, çi pirsgirêka heyî destpêkê nîqaş dikin û dûra wekî komîteya lihevanîn dikev dewrê û çakreser dikin. Her wiha her hefte carek civînên Hevserok û komîte û ji mehê carekê civîn ji giştî ji taxêre tê lidraxistin. Di civîn rewşa dawî, daxwaziyên gel û pêşniyarên wan tê nîqaş kirin."

**Bİ RÊXİSTİNKİRİNÊ HİŞMENDİYA 5 HEZAR SALAN BİŞKÎNİN**

Mêrvet diyar kir ku destpêka avakirina komînan rola jin têde kêm bû, lê di piştî hilbijartina di sîstema nû ya Fêdraliyê de rol û misyona jin di komînan ya herê zêde û şalak bû. Mêrvet wiha dom kir: "Wekî komîteya aborî û perwede projeyên wekî perwerdeya durûtinê, tendrustiyê û kowafor bi buhayek pir kêm vekirin. Ji ber ku armanc avakirina derfetên kar û jin ji wê kevneşopiya hişmendiya mêr û car dîwaran derxin, ku ji sedî 75 jin komînê birêve dibin, tevlî bûna jin ji komîn û komîteyan re vê isbat dike. Komîta jin heftana bi renegkî rêxistinî perwerdeyên xweser dibînin û çi mijarên civakî hebe tê nîqaş dikin, da ku jin kesayet, dîrok û hêza xwe nasbike û li gorî wê tevbigere. JIn heya astekê guhertin avakirin, lê pêwîste tekoşîna guhertin û veguhertinê dewam bike, heya ew hişmendiya 5 hezar salan bişkîne."

**KOMÎN NÎŞANEYA WEKHEVİYÊ YE**

Hevseroka Komîna Ş.Lewnd Mêrvet Ibrahîm bal kişand ser ku berê civak çawa li komînê meyze dikrin û wiha bi dawî kir:"Destpêkê civak komîn wekî marektekê diditin, lê bi xebatek şînber ketin wê ferqê ku rola komînê civakê bi rengekî komînal û kehevî rêxistin dike. Û herkes bi reng, çand û ola xwe bi rengekî azad cihê têde digre, ji ber komîna nîşaneya jiyana komînal û wekheviyê ye."

# Meclisa jin a taxa Zorava hate avakirin

Rêxistina Kongreya Star a taxa Zorava ya paytexa Şamê xebatên xwe yên salekî nirxand û meclisa nû ava kir.
Rêxistina Kongreya Star a taxa Zorava ya Şam'ê civînek lidarxist û xebatên xwe yên di nava salekî de nirxand û meclisa xwe ya nû avakir.
Bi dehan jinên taxê di civînê de amade bûn. Di civînê de rapora xebatên salekê ya meclisa kongreya Star ya Şamê hate xwendin, paşê jî nirxandin ji aliyê beşdaran ve hatin kirin û pêşniyarên wan hatin erêkirin.
Ji bo avakirina meclisa nû jî dengdan hat kirin û endamên nû yên meclîsa Kongreya Star a taxa Zorava hatin hilbijartin.
Endamên nû soz dan ku ew ê ji bo pêşxistina jinan di her aliyan de xeta têkoşînê berdewam bikin…
*ANHA*



# KCDK-E banga tevlêbûna çalakiyan kir

**Li tevahiya Ewropayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakî tên lidarxistin. Wê çalakiyên destpêkê di navbera 7-11'ê tebaxê de bi duruşmeya "Ji Ocalan re azadî" wê bên lidarxistin. KCDK-E'yê daxuyaniyek weşand û ji bo çalakiyên ku li tevahiya Ewropayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê pêk werin banga tevlêbûna girseyî û xwedîderketinê kir.**

KCDK-E'yê ji bo çalakiyên ku li tevahiya Ewropayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê pêk werin banga tevlêbûna girseyî û xwedîderketinê kir.

Li tevahiya Ewropayê ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan çalakî tên lidarxistin. Kurdistanî li gelek navendan dest bi çalakiyan kirine.

Derbarê çalakiyan de KCDK-E'yê daxuyaniyek da û banga tevlêbûna çalakiyan kir.

KCKDK-E'yê diyar kir ku şer û pevçûnên li Kurdistanê û Rojhilata Navîn dijminatiya di nav gelan de zêde dike, polîtîkaya dijberiyê û krîza li herêmê kûrtir dike û got, ''Ev krîza giran û rewşa pevçûnî neçareseriyê ferz dike.

Rêberê Gelê Kurd Rêber Apo ji bo ku hemû nasname û baweriyên cuda bi hev re bikaribin bijîn, ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkan paradigmaya neteweya demokratîk daye. Paradîgmaya bi azadîxwaziya jinê li hemû cîhanê û li Rojhilata Navîn ku şer lê zehf e, weke tekana çareseriyê tê tînin.




Ji bo demokratîkbûna Kurdistanê û Rojhilata Navîn, ji bo avakirina jiyaneke wekhev azadiya Rêveberê Gelê Kurd Kurd Rêber Apo diyarker e. Azadiya Rêber Apo û demokratîkûna Rojhilata Navîn ketine nav hev.

Di kongreya 3'yan a KCDK-E'yê de biryar hatiye standin ku tevahiya salê ji bo azadiya Rêber Apo çalakî werin kirin. Biryar li ser gelek çalakiyan hatiye standin ku paradigmaya Birêz Ocalan danî ber gelên cîhanê bigihînin ber destê hemû gelan û ji bo azadiyê gelek çalakî werin kirin. Bi vê çarçoweyê em çalakiyên xwe yên pêşî di navbera 7-11'ê Tebaxê de li hemû welatên Ewropayê û bajarên wê bi bi dirûşma ''Ji Ocalan re azadî'' wê çalakiyên kon pêk bîne.

Em KCDK-E di serî de bang li gelê Kurdistanê û dostên wê dikin ku bi rengekî aktîf tevlî çalakiyên li welat û bajarên Ewropa bibin.''



## Nikarin HDP'ê ji rê derxînin

Tayîp TEMEL

HDP'ê hilbijartinek gelek dijwar li du xwe hişt. Hin derdor hene ku vê serkeftinê reş dikin û her wekî HDP li Kurdistanê û Tirkiyeyê tevî hemû astengiyan bi ser neketiye û plana desthilatdariya AKP-MHP'ê têk nebiriye.

Êdî lazim e dawî li şîroveyên ku bingeha xwe ji navenda şerê taybet bê. Hewce ye ku hêzên demokrasiyê ji bin bandora şerê psîkolojîk derkevin.

Rejîma zordest bi hemû hêza xwe hewl dide ku partiyên muxalefetê tevlihev bike û wan ji nav de têk bibe. MHP bi tevahî girt bin kontrola xwe û niha hêza ku aqilê stratejîk ê AKP'ê dide meşandin zihniyeta Bahçelî bi xwe ye. CHP ji hundir ve diqilqile û rojnameyên nêzî desthilatdariyê her roj bi hemû hêza xwe êrîşî Kiliçdaroglu dikin û hewl didin îspat bikin ku eniya Muharrem Înce çiqas xurt û mafdar e.

Rewşa Îyi Partî jixwe li holê ye. Wekî bizaveke siyasî bê serok û semyan maye û çi dikin nikarin xwe bi ser hev ve bînin. Ji ber vê yekê ne dûr e ku ew bibin parçeyekê desthilatdariya zordest.

Niha tenê HDP maye ku ligel hemû êrîşan jî mîna kelehekê li ser piyan e û hewl dide bibe hêza muxalefeta sereke. Di hilbijartinê de jî serkeftineke mucîzewî bi dest xist.

Lê navenda şerê psîkolojîk bi her awayî dixwaze serkeftina HDP'ê li ber çavan reş bike û yekitiya wê jî xirab bike.

Bêguman di hilbijartinê de di gelek mijaran de kêmasî û qelsî çêbûn. Lê dema mirov li polîtîkayên 3 salên dawî yên li hemberî HDP'ê mirov li ber çavan digire nabe ku mirov wan serkeftina heyî di bin siya wan kêmasiyan de bihêle.

AKP'ê demek dirêj bû propagandaya 'Gel ji HDP'ê dûr dikeve' belav dikir. Di dema hilbijartinan de lîstika li Kurdistanê li gorî wê gotinê lîstin. Ji bo ku vê gotina xwe piştrast bike lîstîkek kûr li ser rêjiya dengan lîstin. Serî li hemû rêyan dan ku dengên HDP'ê li Kurdistanê kêm bikin û ev yek heta dereceyekê jî kirin.

Niha divê bê zanîn ku tu kesekî beriya niha deng daye HDP'ê tercîha xwe neguheriye û deng nedaye AKP'ê. Hele hele divê bê zanîn ku tu kurd deng nadin MHP'ê. Lewre jî dengên zêde yên MHP'ê yên li Kurdistanê hêjayî lêkolînê ne. Bêguman hinek ji wan ên wan kesên ji bo şer hatine Kurdistanê ne. Lê yên din ji bo ku gotina; 'MHP jî deng ji kurdan werdigire' bînin ziman bi lîstikê hatine eyarkirin.

Du gotinên xeternak hene ku navenda wan Biryargeha Şerê Taybet e. Ya yekemîn; 'HDP li Kurdistanê deng winda kir' û ya duyemîn jî 'HDP çiqas gotinên xwe yên kurdparêz kêm bike ew qas deng ji Tirkiyeyê werdigire' ye. Armanca gotina yekemîn ew e ku HDP di nav kurdan de bêhêz nîşan bidin. Armanca gotina duyemîn jî ew e ku HDP'ê ber bi zihniyeta Kemalîst a înkarê ve dehf bidin.

Lê HDP tifaqa gelê kurd û gelê tirk e. Ew partî hemû gel û baweriyên li Tirkiyeyê di nav xwe de dihewîne. Ji ber vê yekê jî hizr û baweriyên di nava HDP'ê de rengîn û cuda ne. Lê ji ber nirxên pîroz HDP'ê li ser piyan digirin, dê nikaribin HDP'ê ji rêgeha wê ya rastîn derxînin.

Lazim e her dildarê HDP'ê li hemberî gotegot û lîstîkên şerê psîkolojîk hişyar û baldar be.

# Tecrîda li ser Ocalan kaosê kûrtir dike



Hevberdevka KCD'ê ya Amedê Zelal Bîlgîn, diyar kir ku tecrîdek girankirî ya taybet li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan heye û got: "Tecrîda li ser Ocalan kaosa li Rojhilata Navîn mezintir dike ger tecrît rabe wê ev kaos jî bi dawî bibe."

Parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ji 27'ê Tîrmeha 2011'an ve û malbatên girtiyên li Îmraliyê jî ji 11'ê Îlona 2016'an ve nikarin biçin hevdîtinê û hevdîtinên wan tên astengkirin. Li ser Ocalan tecrîdek girankirî ya taybet heye. Hevberdevka Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) ê ya Amedê Zelal Bîlgîn, derbarê tecrîdê de axivî û wiha got: "Îro kaosa li Rojhilata Navîn tê jiyîn bi tecrîdê ve girêdayî ye."

### TECRÎD LI DIJÎ JINANE

Bîlgîn, anî ziman ku pêkanînên tecrîdê li dijî destkeftiyên jinane û wiha dewam kir: "A rast qedexeya li dijî Ocalan, di heman demê de qedexeya li ser destkeftiyên jinane. Bi tecrîdê re, hişmendiya serdest a zilam bi awayên cuda derdikeve holê. Di 3'yê Tebaxê de em bûn şahidê komkujiya li ser Êzidiyan, jinên Êzidî yên di bazaran de hatin firotin, tacîz, tecawîz û talankirinan. Cardin heman pergala ji aliyê hêzek bi hov ve pêk hat. Rêxistina terorê ya DAIŞ'ê derxistin holê û jin hatin hedefnîşandan. Ev ji tecrîdê ne cudatire. Girêdanbûna wan bi hevre heye."

Bîlgîn, di dewama axaftina xwe de wiha got: "Hewl didin enerjî, hêz û baweriya jinên hatine hedef nîşandan ji holê rabikin. Dixwazin jin dest ji têkoşîna xwe ya azadiyê berdin û tim hişmendiya desthilatdar a zilam li ser kar be. Pêkanînên li girtîgehan, şaşiyên hikûmetê yên di siyasetê de dike, tayîn kirina qeyûman, û erkên bêsînor ên dan waliyan bandorak mezin li ser civaka Tirkiyê dike. Civak êdî ji vê rewşê bêzar bûye û dixwaze ji vê rewşê derbikeve."

### TECRÎDÊ WEKE KOZ BIKARTÎNIN

Hevberdevka KCDK'ê a Amedê Zelal Bîlgîn, di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Şert û mercên tecrîdê her roj derbas dibe, girantir dibe. Tecrîd siyaseta Rojhilata Navîn dixetimîne û bi vê dixwazin têkoşîna azadiya jinan têk bibin. Hişmendiya tekparêz vê li dijî gelan weke koz bikar tîne. Em dixwazin tecrîd bê rakirin. Ocalan rêbereke ku pêşiya siyasetê vedike. Mûdaxeleyên Rêberê Gelê Kurd Birêz Ocalan ên li ser polîtîkayên Rojhilata Navîn siyaseta heyî bandor dike û dihêle ku nefes bigire û pêş de biçe."

# Danûstandina li Şamê gaveke zîrek e

Parlementer û rojnamegerê Lubnanê Nasir Qendîl vekirina kanalên diyalogê di navbera MSD û rêjîma Sûriyê de weke gaveke zîrek bi nav kir û diyar kir ku ev pêngav wê çarseriya alozî û rizgarkirina axa Sûriyê ji dagirkeriya Tirkiyê bi xwere bîne.

Parlamenter û rojnamegerê Lubnanî Nasir Qendîl li bajarê Şamê şahiya îmzekirina pirtûka xwe ya bi navê "felsefeya hêzê" li pirtûkxaneya El-Esed a Şamê li dar xist.

Qendîl piştgiriya xwe ji bo hevdîtinên di navbera MSD'ê û rêjîma Sûriyê de anî ziman û wek "gaveke zîrek" bi nav kir û wiha got: "Ev nûnertiya rihê berpirsyariyê dike, hêviya min bi serkeftina van danûstandin û hevdîtinan gelekî mezin e."

Qendîl di berdewama axaftina xwe de wiha anî ziman: "Divê em bi rihekî berpirsyar û wijdan bibêjin ku pêngava MSD'ê û vebijartina wan ji diyaloga bi rêjîma Sûriyê re nûnertiya rihê berpirsyariya niştimanî dike û zîrekbûneke stratejîk e.

Derbarê serkeftina van hevdîtinan de Qendîl wiha li axaftina xwe zêde kir: "Bi izna Xweda ev rêya ber bi serkeftinê ve ye û wê sîleyeke hişk li guman û xewnên sultaniyeta îslamî bide ku hewl dide beşekî ji axa Sûriyê di bin hinceta îdiaya xwecûdakirina kurd li Bakurê Sûriyê dagir bike."

Parlamenter û rojnamegerê Lubnanî Nasir Qendîl axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Vegerandina têkliyên di navbera kurdan û rêjîma Sûriyê de û hevbeşiya wan di hûnandina şêwazê dewletê û naveroka wê de gava herî girîng ber bi rizgarkirina axa Sûriyê ji dagirkeriya Tirkiyê ve ye."…*ANHA*






# Çete zextê li Êzidî û Elewiyan dikin

**Kiryarên leşker û çeteyên dagirker yên li Efrînê berdewam dikin. Komên çete yên girêdayî artêşa Tirk a dagirker li Efrînê zextên xwe yên li ser civaka Êzidî û Elewî jî didomînin. Hat ragihandin ku Koma çete ya Feyleq El-Şam û Ketîba El Hemzat zarokên Êzidiyan bi darê zorê rêdikin camiyan û malên Elewiyan jî dikin mizgeft.**

Koma çete ya Feyleq El-Şam ên girêdayî artêşa Tirk a dagirker zarokên Êzidî yên gundê Basûfanê navçeya Şêrawa ya Efrînê bi darê zorê rêdikin mizgeftan. Komên çete yên bi navê Ketîba El-Hemzet jî, dibistan û hin malên sivîl ên Elewiyan ên navçeya Mabeta dikin mizgeft û dibistanên Şerîetê. Hat diyar kirin ku kesên vê yekê qebûl nakin jî tên girtin, revandin û îşkence kirin.

Komên Çete yên girêdayê Artêşa Tirk a dagirker kiryarên guherandina demografî û bişavtina gelê Efrînê berdewam dikin. Çete û leşkerên dagirker ku ji destpêka dagirkirina Efrînê û vir ve hemû cih û warên dîrokî, pîroz ên Êzidiyan û Elewiyan tarûmar kirin, niha jî bişavtinê û guhertina ol li ser Êzidî û Elewiyên li herema Efrînê zextan dikin. Ji aliyekî ve komên Feyleq El Şam ên girêdayî Tirkiyê zarokên Êzidî bi darê zorê dişînin mizgeftan, li aliyê din jî komên Ketîba El Hemzet jî dibistan û hin malên Elewiyan dikin mizgeft û dibistanên Şerîatê.



### ZAROKÊN ÊZIDÎ BI ZORÊ DIBIN MIZGEFTAN

Li gorî agahiyên çavkaniyên heremî, hat diyar kir ku komên Feyleq El Şam, li gundê Basûfanê yê navçeya Şêrewa ya Efrînê zarokên Êzidî ji malan derdixin, bi zorê dibin mizgeftan, li ser ola Îslamê dersan didin wan û Quranê fêrî wan dikin. Çavkaniyên herêmî, destnîşan kirin ku kesê bi navê X.K ku nexwest zarokên xwe bişîne mizgeftê li gund rastî îşkenceya komên Feyleqe El Şam hatiye û jineke ciwan a Êzidî revandin û agahî jê nayê girtin.

### MALÊN ELEWIYAN DIKIN MIZGEFT

Li gorî agahiyan, hat diyar kirin ku kiryarên bişavtinê ne tenê li ser civaka Êzidî, di heman demê de li ser civaka Elewiya ya li Efrînê jî tê meşandin. Hat hîn bûnku komên çeteyên Ketîbeya El-Hemzet dibistana gundê Kaxrê ya navçeya Mabeta ya Efrînê veguhestine dibistanek Şerîetê û tenê dersa ola Îslamî tê de didin. Li aliyê din mala jina Elewî ya bi navê Henan Ereba jî veguhestine mizgeft û tê de dersên Ola Îslamê didin.

Hat diyar kirin ku li heman heremê 3 xaniyên Elewiyan ên ji heremê hatine derxistin jî, ji bo veguherînin mizgeftê amadekarî tên kirin.

# Li Sûweydayê rejîm û DAÎŞ şerê hev dikin



Li bejahiya Suweydayê hêzên rejîmê û DAÎŞ şerê hev dikin. Li Humisê êrîşeke bi amûrên hewayî li dijî Baregeha Şayratê pêk hat. Mala Çavdêr a Mafê Mirovan a Sûriyê got li rojhilat û rojhilatê bakur ê Sûweydê, li gelek herêman di navbeyna hêzên rejîmê û çeteyên DAÎŞ'ê de şer heye.

Di şer de gelek moşek têne avêtin û hêzên rejîmê dixwazin DAÎŞ'ê li Sûweydê biqedînin.

### FIKARA LI SER REHÎNEYAN

Ji ber sedema şer fikar li ser ewlehiya jiyanê ya rehîneyên Sûweydî heye, ku di dest çeteyên DAÎŞ'ê de ne.

Piştî ku Sûweydiyan nexwestin ku çeteyên DAÎŞ'ê di Yermûkê re neqlî Sûweydeyê bikin, hevdîtinên di navbeyna Rûsya û DAÎŞ'ê bi asteng bûn. Tê gumankirin ku çete birin rojhilatê Xûmisê yan jî Dêrazorê, diyar bû ku çeteyan ev vebijêrk red kiriye.

### ÊRÎŞA SER BAREGEHA ŞAYRATÊ

Mala Çavdêr her wiha got li rojhilatê başûr ê Xûmisê gelek teqîn çêbûne, sedema teqînan êrîşa bi amûrên hewayî ye ku birine ser baregeha hewayî ya leşkerî ya Şayratê ya bi Xûmisê ku bi kontrola rejîmê ye.

Piştî êrîşa bi amûrên hewayî ya bi ser baregeha leşkerî ya Rûs a Hmeymimê de, ev dibe êrîşa pêşî.

# Li Iraqê serhildana gel didome

Li Iraqê li dijî gendeliyan serhildana gel didome, li Bexdayê ku hê hikûmeta nû jî ava nebûye û ji bo çareseriya pirsgirêkê qels dimîne.

2003'yan piştî hilweşîna rejîma dîktatorî ya Seddam Hisên li gel ku bi sedan milyar dolar hatin terxankirin jî li Iraqê bi milyona kes ji xizmeta dewletê sûd wernagire. Li dijî nebûna xizmeta dewletê helwesta herî mezin li başûre welêt, li herêma zengîn a petrolê Basrayê û bajarên başûr xwe nîşan da. Li Bexdayê li hin kolanan çalakiyên blokajê hatin kirin û hate gotin li bajarên weke Muhtana jî wê çalakiyên wiha bibin.

Hilbijartina ku Gulanê hatîn kirin û ji ber sedema gelek bêşêwaziyan hê hijmara wê jî nehatiye kirin, hê jî neavabûna hikûmetê jî helweta gel tundtir dike.


Ev nêzî 2 mehan e li Besra, Necef û bajarên dî yên Başûr çalakî didomin û çalakiyan xwe gihandibû paytext Bexdayê jî. Xwepêşandêr dixwazin navê kesên ku tevî nav gendeliya bi milyoran dolar bûne werin eşkerkirin û li dijî gendeliyê têkoşîneke dijwar were kirin.

Hikûmeta bi Serokwezîrtiya Haydar Ebadî bi ragihandina ku ew ê navê 73 kesê ku tevlî karê gendeliyê bûne eşkere bikin armanc kiribûn ku çalakiyan rawestînin. Tê payin ku ev soz were bicihanîn.

Li Iraqê li gel dewlemendiya petrolê jî dahata bi rengê xizmetê li gel venagere û ev dibe bertek. Ji dema hilweşanîna dîktatoriya Sedam ve tê texmînkirin ku ji bo hilberandina elektrîkê 40 milyar dolar hatiye veqetandin lê hê jî li bajarên başûr elektrîk qut dibin.

Tê zanîn ji hêla bertîl û gendeliye ve qerneya Iraqê ne baş e. Di lîsteya têkoşîna dijî gendeliyê de di nav 173 welatan de Iraq di rêza 165'an de ye.

Ji bo ku krîz çareser bibe avabûna hikûmeta nû ji hêla her kesî ve weke gaveke girîng tê dîtin. Lê li gel rêveberiya xirab a 4 salan a Haydar Ebadî jî, ku di hilbijartinê de bi ser nekte, îhtîmal e ku Ebadî bi hin formulên tifaqê Muqteda es Sadr li der bihêle. Ev jî wê krîza heyî girantir bike.





## Heke muxalefet ev be …

Mihemed ŞAHÎN

F.Gulenê şirîkê Erdogan du sal berê "lutfa xweda" hewla derbeyê pêşkeşî Erdogan kir. Yên ku hewldan darbe bikin kadroyên F.Gulen ên ku di serdema AKP'ê de bi payeyên bilind hatibûn erkdarkirin.

Bi erkdarkirina wan qadroyan AKP'ê bi xwe pêşî li derbeyê vekiribû. Berpirsiyarê derbeyê yekemîn AKP bû, yê ku hewce bû di rêza yekemîn de hesab bide AKP bixwe bû. AKP'ya ku hewce bû hesab bida jiber lewaziya muxalefetê tenê bi gotina "em hatin xapandin" karî xwe ji hesabdayinê xelas bike. Li cihê ku hewce bû muxalefet ji AKP'ê hesab bipirse jibo tasfiyekirina siyaseta Kurd piştgiriya AKP'ê kir û destnedana wekîlan rakirin.

Erdogan bi hinceta "lutfa xweda" rewşa awarte îlan kir. Di pêvajoya rewşa awarteya ku demokrasî, hiqûq, nirx û pîvan hemû hatine bin pê kirinde ji bo pêk anîna desthilatdariya xwe ya yek kesî biryara referandûmê da. Di 16'ê avrêla 2016'de referandûm pêk anî û bi biryara YSK'ê xwe serkeftî îlan kir. Muxalefetê qet negot di van şert û mercên awarte yên bêhiqûq de referandûm nepêkane û ji bo ku em nabin amûrê vê bihiqûqiyê emê referandûmê bayqot bikin, piştî referandûma derhiqûqî negot emê meclîsê biterikînin. Bi helwesta xwe hevkariyê referandûma bê hiqûq meşrû kir û bi serde nerazûbûn û berxwedana gel jî asteng kir.

Erdogan-Bahçelî ji bo di şert û mercên awarte de hemû hêz û derfetên dewletê bikar bînin û îradeya gel xesp bikin biryara hilbijartinên nijde yê 24'ê pûşperê dan. Muxalefetê dîsa negot, di rewşa awarte de, di tunebûna hiqûqê de, di bin zext û zordariyan de, di nava dek û dolaban de, bi hebûna benda sedî 10 hilbijartineke adilane nepêkane û em qebûl nakin. Tevilê leyiztoka hibijartinên ku hemû qayedeyên wê ji hêla Erdogan ve hatin diyarkirin bû û careke din bi hilbijartineke derhiqûqî û bêedalet serkeftin pêşkêşî AKP'ê kir. Bi ser de weke ku di hilbijartineke gelek bi edalet de bi serketiye Erdogan pîroz kirin. 45 roj biser hilbijartinên 24'ê pûşperê re derbas bûn. Em li bendê bûn hemû partiyên muxalîf bi nirxandinên kûr û hûr hilbijatinan binirxînin, kemasiyên xwe bibînin û reqnedayinên xwe bidin gel.

Em li bendê bûn muxalefet bi lêkolînên gelek girîng, bêhiqûqî, bêedaletî û nerêtiyên AKP'ê yên hilbijartinan yek bi yek tespît bikin û bi raya giştî ya cîhanê re parve bikin.

Em li bendê bûn muxalefet ji kêmasiyên xwe yên kronîk yên bê derman waneyan derbixe û piştî nîqaşên giranbuha nekşerêya berxwedan û serkeftinê pêşkêşî gel bike.

Mixabin, 45 roje partiyên muxalîf li gorî xwesteka dilê AKP û çapemeniya hewzê tevdigerin. 45 roje bi pirsgirêk û pêşbirka bidestxistina desthilatdariya navxweyîve mijûlin.

Di rojeva muxalefetê de nirxandina hilbijartinan tune ye, teşhîrkirina bêedaletî, bêhiqûqî û nerêttiyên AKP'ê tune ne, nemeşrûbûna serkeftina AKP'ê tune ye, bê wate bûna meclîsê tune ye, serûbinbûna pergalê tune ye, binpêkirina hiqûq û wêranbûna pergalê dadmendiyê tune ye, mayınde bûna OHAL'ê tune ye, avabûna pergalê dîktatoriyê û berdêlên wî yên li ser civakê tune ye, nîqaşên diyarkirina rê û rêbazin berxwedana li dijber pergalê dîktatoriyê tune ne.

Jiber wêye ku qeyrana aboriyê roj bi roj weke kabûs li ser civakê rûdinê, îflasa siyaseta AKP'ê ya navnetewiya şantajê ya li ser rehîneyan ku dolar biriye ser 5.30 lîre yê, bûha bûna pêdiviyên jiyanî yên weke, nan, av, ceyran, xaza zwezayî û hemû xwirêkan qet nayên rojeve. Li gel van geşedanên ku rojbiroj civakê weke aş dihêrin û bêzar dikin AKP dikare weke ku qet tiştek nebûbe Tirkiyê birêve bibe.

Bi saya vê muxalefetê Erdoganî tenê bi pêşkeşirina projeya xwe ya "Kahvexaneyên Mîlî, Kek û Çaya belaş" karî di hilbijartinan de serkeftinê bidest bixe.

Heke muxalefet ev be wê dîktatoriya Erdogan jî gelek hêsan û rewa be.